# Tirkiyê Ji Avabûnê Ve Heya Îro

Beşa 1



Şakir Molayî

Piştî serketina tevgera serbixwe xwazên neteweyî bi ser hevpeyman û alîgirên wê de, anku nêzîk bi sedsalekê berî niha Komara Tirkiyeyê li ser bingeha xelafeta Osmannî hate damezirandin. Ji wê demê ve heya niha ew Komare di çendîn qonaxên cuda û pir aloz de derbas bûye û bi çend arîşeyên hundurîn ku heya niha jî çaresernekirî mane, berbirû ye û ne tenê pirsgirêk kêm nebûne, belkî li durêyek pir aloz de jî asê maye ku derman û çareseriya wan hewcehî bi rêberiyeke hejî, demokrat û xwedî bandor heye, lê mixabin heya niha rêberiyek bi van taybetmendiyan derneketiye qadê yan nehiştine derbikewe.

Heyamê navbera avabûna Tirkiyê heya nîviya sedsala Bîstem, qonaxek e ku têde dewletê di bin sîbera kemalîzmê de çarçoveya jiyan û berbi pêşde birinê, di çarçoveya civakekê de, xwe rengrêj kiriye. Taybetmeniyên wê qunaxê, tekoşîn bo dûrketin ji Îslamê, xwe nêzîkkirin bi Rojava û Yekîtiya Ewropa (YE) yê ye. Paşan bi girtine pêş a siyasetek netewî û sekolarîstî bi riya hikûmetek tekpartîtî û tund û tûj desthilata xwe bi ser hemû civaka pirçandî, pir zimanî û pir netewî ya Tirkiyê de sepand, û dirûşma yek ziman, yek gel, yek ala û yek ax bû stratejiya dewletê. Helbet bêy wê ku derfetê bi tu partiyek din bide ku xwe derxîne nava siyasetê û xebatê bi armancên cuda bimeşîne, bona wê ku tu car nekare desthilatê ji partiya Komara Gel (CHP) bistîne ku di tev dewreyan de take partiya desthilatdar bûye. Ji ber ku kemalîzmê her hizreke cuda ji xwe bi hêceta dijberî bi yekîtiya netewî, mesebî, çînayetî qedexe kiribûn. Wan ji bilî girtina bera siyasetek şoven û faşîstî, asmîlasiyonek berfireh û xurt li hemberî netewe, ziman û kulturên cuda ji tirk (bi taybet kurd) meşandin û her liv, bizav û xebatek di çarçoveya mafên netewî de bi tundî tepeser dikirin û heya niha jî li ser vê rêbaza xwe de berdewam in. Bi vê çendê jî mezintirîn beşa Kurdistanê li bakûr bo çendîn deh salan di bin sîbera hikûmetên mîlîtarîstî yên li pey hev di nav xwîn, rondik û kavilkariyan de xemilandine. Desthilata Tirkiyê bi hemû şêwazên tund û tûj, dest avête operasiyona helandin û tepeser kirina netewên ne tirk bi taybet kurdan. Wan tim didan zanîn ku xincî tirkan, yên din tenê mafek hene. Ew jî bindestî ye, lewma nivîserek wekî Mihemed Uzon dibêje, “Bingeha dewleta neteweyî ya Tirk li ser dijberîkirina kurdan hatiye damezirandin”.



Qunaxa duyemîn a Tirkiyeya hevçerx, serdemê şerê sar e ku piştî şerê cîhanî yê duyê destpê dike û heya şerê kendawê li destpêka salên 90’an berdewam dibe. Tirkiye her piştî şerê cîhanî yê duyê xwe da aliyê hevpeymanan û bi destpêkirina şerê sar jî her ku dihat, zêdetir xwe bi Ewropaya rojava û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) nêzîk dikir. Ew jî bû sedem ku li asta hundirîn de bi rûyekî dawî bi desthilatdarî û qorixgeriya rejîma Ataturk bê û destpêkek rûyekî ya nû a jiyana pir partîtî, lê di çarçoveya sîstema kemalîzmê de derkewe rojevê ku bi desthilatdariya Partiya Demokrat dest pêkir.

Destpêkirina qunaxa pir partîbûnê derfetek bo artêşê pêkanî ku bi navê parastina sîstemê, dabînkirina aramiyê, parastina tenahiya netewî û yakparçeyiya axa welat, derbeyan li hikûmetê bixe. Wê qunaxê 3 kûdetayên serketî (di salên 1960, 1971 û 1980’î de), 3 kûdetayên sernegirtî û çend hewlên kûdetayî ên din girte xwe. Lê wan kûdetayan ne tenê nekarîn aramiyê bo welat misoger û çavkaniya pirsgirêkan destnîşan bikin, belkî di bin sîbera rewşa nebaş ya herêm, cîhan, şerê sar û pirsgirêkên siyasî, netewî û çînayetî yên hundirê Tirkiyê de heya ku diçû, asayîşa siyasî û rewşenbîrî ya welat ber bi pêşerojek nediyar dibir. Bi awayek din serdestiya teror û mafyayên dewletî, operasiyon û serkutên artêş û dezgehên ewlehiyê bo ser bizav û çalakên siyasî û rewşenbîran berfirehtir dibû. Çend salan piştî kûdetaya sala 1980’an, anku li sala 1984’an de Partiya Karkerên Kurdistanê xebata çekdarî ya xwe li başûrê rojhilatê Tirkiyeyê ragihand. Wê xebatê çiqas derfet bo vejandina hest û seha netewî a kurdan pêkanî, ewqas jî hêzên şoven, hikûmet, artêş û saziyên aborî û kulturî yên Tirkiyê har û tund û tûjtir kir. Bi awayekê ku Tirkiye rastî şerekî bixwîn kir û heya niha tu yek ji siyasetvanên tirk ger ku hest bi pilîta agir jî kirbe, hinde wêrek nebûye ku xwe bavêje nav vî agirî. Tenê di destpêka salên 90’î de bû ku yekem Serokkomarê Tirkiyê hewl da li ser vê mijarê xwe biceribîne ku ew jî Turkut Ozal bû û ji ber çend şaşiyan û mirina bi guman a wî, ew hewl jî bidawî hat.

Qunaxa sêyemîn bi bidawîhatina şerê sar û bi destpêkirina globalîzmê destpê dike û heya niha jî berdewam e. Aşkera ye Tirkiye li qunaxek lawaz a siyasî, aborî û civakî de tevlî vê dewranê bû, ew jî bi lawaziya hikûmetê, gendeliya siyasî, bêhêziya aborî, maratona li pey endambûn di Yekîtiya Ewropayê, berdewamiya siyaseta înkarê, tund û tûj bûna şerê Kurdistanê, jordeçûna hejmara goriyên terora dewletê û mafyayên dewletî “Ergenekon”ê û herwiha revandin hepsîkirina Serokê PKK, Ebdula Ocalan despê kir.

Di 10 salên duyem yên vê qonaxê de ku hevdem e li gel şerê li dijî terorê bi rêberiya Amerîkayê di cîhanê de, di hundirê Tirkiyê de jî bandor kir û pêvajoya siyasî kete destê îslamiyên nermrew ku sekolarîzma dewletê û li gel parastina hevalbendiya bi rojava re, nizîkatiya bi welatên Îslamî bi taybet yên deverê kiriye bi beşek ji statejiya xwe. Ew jî xwe di Partiya Dad û Geşepêdanê (AKP'ê) de dibîne. Desthilatek ku hinekê bi yên berê di gotara xwe ya siyasî û aborî de biferq e û di encama lîberalîzekirina aboriya Tirkiyê heya qasekê rewşa tex û qatên cuda yên civakê baştir kir.

## Îdama cudabîrên kurd dibe bilez bihê hilweşandin

Roja 8’ê Pûşperê Saziya Çavdêrên mafên mirov ragihand: dezgeha dozgerî a Îranê dibe bilez xwe ji birêvebirina îdama Zeyneb Celaliyan û cudabîrên kurd biparêze.

Zeyneb celaliyan û 15 çalakên din ên kurd niha di girtîgehên Komara Îslamî a Îranê de hukmê îdamê bi ser wan de hatiye sepandin.


Berpirsên rejîmê, navhatî ji peywendiyên derveyî girtîgehê û destgihîştin bi parêzer, bêbeş kirine û rewşa wê niha nediyar e.

Rejîmê bêy tu belgeyekê tometa muharibe (Şer tevî Xwedê) û peywendî ligel partiyekî kurdistanî de hikmê îdamê bi ser de sepand.

Hevdem saziya Efûya navnetewî ji li daxuyaniyekê de ji desthilatdarên Îranê xwast ku bilez hukmê îdamkirina hemû wan girtiyên bi îadamê hatî mehkûmkirin, helweşîne, bi taybetî Zeyneb Celaliyan û Sekîne Mihemedî û carek din bi yasaya îdamê bi mebesta eşkerekirina hûrdekariyên tewaw ên hukmên îdamê de here û tevlî pêvajoya geşekirina civaka cîhanî bo nehîştina îdamê bibe.

www.arsivakurd.org

# Zarokên Kurd Goriyên Sereke Ên Hejariyê



**Ceifer Mubeşirniya**

Nebûna kar û kasibî û senet li Kurdistanê ji aliyekê, û nebûna dezgehên ragihandinên hundirî welat ji bo hişyarkirin û gihandina zanyariyên pêwîst li ser mafên xelkê û erkên hikûmetê ji aliyek din, bêhîvîbûn ji kar û senetên îstandard a cîhanî ya karkirinê, gelek mafên rewa ên xelkê ku hikûmet jê berpirsyar e, ji bîr kirine û di encama nebûna zaniyariyên pêwîst de ji bo xwe jiyandinê, dest avêtine karên destî ên amator û di wê navberê de tenê heşên wan di çarçoveya dahata jiyana di riya heqdestê wan de ye. Serbarê van êş û azarên jiyanê, gelek caran bûyerên nexweş jî rû didin û wan tûşî xesarên qerebonekirî dikin.

Yek ji wan karên destî ên ku bi awayek amator tê encamdan, çêkirin û raçandina tewnên mafûr “ferş”an e. Her wek hemû cîhan dizane, mafûrên destî ên Îranî di asta cîhanê de nav û dengek taybetî hene û di pileya yekimîn de ne, lê birastî jî bi tu awayekê ew dengvedana mafûrên Îranî ku piraniya wan li Kurdistanê tên çêkirin, cihê şanaziyê ji Kurdan re nine. Çunku mirov dikare bêje ew karê ku Îran pê dinaze bi jinavçûna jiyana ciwanên Kurd bi taybetî keçên nûciwan tên çêkirin, ku eger seba neçariya bêkarî û nedariyê nebe, bi tu awayekê ew karê han yê zirarmend di warê tendirustî û hin zirarên din ên civakî, karê nûciwan û ciwanan nine.

Ew karê han xêncî mafûran ku istandardek cîhanî hene û pir buha ne, lê ji aliyê din ve, di her warekê de karek neistandard û neyasayî ye.

1. Berî her tiştî ew kar hêj bi awayê seneta zanistî nahê encamdan, belkî her bi awayek amator û pir îza ji aliyê karkerên wê, tê birêvebirin. Bo mînak, şîweya rûniştina wan kirêkaran bo demê pêtir ji 10 demjimêran di rojekê de li ser tewnên mafûran, heya niha pir caran bûye sebebê nesaxiyên piştêşî û herweha nesaxiyên çavan.


2. ji bo ku xwedî kar heqdestek kêmtir bidin û di karkirinê de jî reftarên bi kêfa xwe ji karkeran re bikin, piraniya karkerên wî karî, zarokên temen jêr 15 salî ne û di nav wan de jî piranî keç in. Ewa jî li gel yasayên navnetewî ên li gor mafên zarokan nagunce.

3. Ew karê han daymî ye û dema karkirinê di rojê de diyarîkirî nine û gelek caran bi şev jî tê encamdan Bi kurtî dema wî karî, ji 8 demjimêran a istandarda karkeran di rojê de pir zêdetir e.

4. Zarokên ku wî karî dikin di destpêk de heya hînî wî karî dibin bi xorayî kar dikin û hin ji wan jî pişti hînbûnê nirxa heqdestê wan diyarîkirî nine belkî li gor nirxa mafûran e. Ewa jî bi awayek xapandina wan zarokan e ku bandora nirxa alwêra wan mafûran li ser heqdestê rojane yê wan heye, çunku hin ji malbat, mafûran bi kirê werdigrin û salane zarokên xwe pêve mijûl dikin di dawî de tenê qazancê mafûr tê ber çavên wan lê zehmet û mandîbûna zarokan di wê navberê de tê windakirin, ku ewa jî binpêkirina mafên zarokan e ji aliyê malbatên wan ve Mirov dikare bêje hejarî îzin nade malbatan, ku mafên xwe û zarokên xwe binasin.

6. ji hemûyan girîngtir zarokên wî karî dikin, ji xwandin û perwerdeyê bê par in.

Meseleyek din ku bi raya min gelek girîng û xesareke mezin e, mifahsitandinên xerab ji baliqnebûna eqlê zarokên keç e ku gelek caran di kargehên mafûran de ji aliyê xwedîkar yan hostayên wan ên mêr ve tê encamdan weke destdirêjiyên cinsî ku di temenê herzekariyê de ku temenek pir hesas e û pêwîstî bi çavdêriya dayk û baban heye, ew zarok di nebûna siya pêwîst a dayk û baban û wê çavdêriyê de tûşî şaşiyên civakî dibin û li gorî kevneşopiya civakê ji aliyê malbanên xwe ve tên kuştin, ku bi qetlên namûsî hatiye naskirin ku mixabin di Kurdistanê de pirr gelek e, yan jî ji wî kesê tecawizker yê ku temenek çend hemberî xwe heye, tên marekirin û heya dawî ji mafê jiyanê bê par dibin.



Her yek ji wan xalane û hin hûrdekariyên din di cihê xwe de, binpêkirina mafên zarokan e, herçend ragihandinên cîhanê di warê mafên zarokan de pir ji zanyarî haydarkirin û şiroveyên di warê mafên zarokan e, lê di rastî de, ew zanyarî nikarin di pêxema haydarkirina zarok û malbatên wan de, rolê xwe bilîzin û xizmetek bikin, ew jî bi hin sedeman. Weke her der a wê cîhanê, veguhastina zanyariyên pêwîst ên derheq yasayên navnetewî û rênimayiyên nawendên çalak ên sîvîl di warê mafên rewa ên tex û qatên civakê û xweparastin ji zirarên karên neyasayî û diyardeyên qirêj ên civakî, ji riya ragihandinên hundirîn ên welat bi zimanê xwemalî û şîroveyên pêwîst, ku bikare di bilindkirina asta hişyariya xelkê de bandora xwe hebe. Gelek hewce ye, Lê mixabin xebat bo wiha karek yan hewildan bo hişyariya xelkê di welatê me de tawane û serî ji pirsek siyasî û di encam de darê îdamê derdixe.

# Ehmedînijad Wêcarê Hicab Kir Mijara Xapandina Xelkê

Dawîn axaftinên Mehmûd Ehmedînijad li ser pirsa hicaba jinan, ew bû ku vê carê xwe ji biryarên hikûmetê xwedî dernexist û di bernameyek zîndî a televîzyonî de ragihand: "Em wê riftarê bi bêhurmetî dizanin ku gava jin û mêrek di şeqamekê de bi hevre bihên dîtin û kesek biçe û bêje wan, we çi nisbet û peywendiyek bihevre heye!? Dewlet wan riftaran napejirîne û heta ku bikare dê kuntirol bike"!!

Herweha got: "Hin kes di hikûmetê de herçend meh carekê dixwazin aloziyekê di welat de pêkbînin. Lê ez radigehînim ku emê bi tundî li hember wan de rawestin û li bingeh de em ligel wê hizrê de ninin!!!

Ewe di demekê de ye ku di meha derbasbûyî de hêza Întizamî li gor terhê xebat dijî bêhicabiyê û "muzahimên namûsî" di nav bajaran de, riftarên tundûtûj bikar anîne ku nimûnên wan di fîlman de liser torên enternêtê pir in.

Ew gotinên Ehmedînijad ne tenê rikeberên xwe, belkî hevbîr û alîgirên wî jî nerihet û nîgeran kirin û hin ji wan nerazîbûna xwe nîşandan. Yek ji wan tundajoyan, Ehmed Xatemî endamê Heyeta Serokatiya Meclisa Xubrigan û ser bi eniya pawanxwazan, ragihand ku Serokkomar netenê ji wê pêla pîroz a parastina hicabê re piştevan nebû, belkî dijberiya wî karê pîroz jî kir.

Ji aliyek din ve Mihemed Ceifer Muntezirî, Serokê dîwana Edaleta îdarî gotinên Ehmedînijad rexne kirin û got: "Çima hin kes wê îznê didin xwe ku rojekê di cihê nîgehban de birûnên û yasayê berevajî yasaya Îslamê bidin nasîn û rojekê jî di cihê feqîhan de birûnên û futwayan bidin".

Herwiha Nûnerên rohanî ên perlemanê jî bi komkirina wajoyan bo hişdarîdan bi Serokkomar gef xwarin.

Hevdem Elî Muttehirî di got û bêjekê de li gel “Xeberonlayn”ê de got: Ehmedînijad di pirsa hicabê de bi zindîkirina çanda Îrana kevnar, di bin bandora Rehîm meşayî de ye.





Rojnama Keyhan ku belavokek hikûmetî û alîgirê Ehmedînijad e, gotinên Ehmedînijad seba hicaba jinan bi tundî rexne kir.

Piştî du hefteyan hêza Întîzamî a Komara Îslamî, hikûmeta Ehmedînijad bi perpirsyarê terhê hicabê da zanîn. Lê ewa cara yekemîn nine ku rejîm maşkanêya wiha ji bo xapandina xelkê dilîze û bi meşandina vê siyasetê him jinan diçewsînin, him pêlên serkutê xurt û berfireh dikin û him jî bi bizirkirina dewsa xwe xelkê pê dixapînin û dixwazin rûçikek baş ji xwe nîşan bidin û her carê yekê yan aliyekê li rûyekî de bi berpirsiyar bizanin.

www.arsivakurd.org

# Diyardeyek mezin û çareserkirina wê



**Azad Kurdî**

Di nav dehan diyardeyên civakî yên Rojhilatê Kurdistanê de ku di 30 salên borî yên desthilatdariya Komara Îslamî ya Îranê de zêde dikeve berçav, xwekuştina jinan û ji wê nexweştir awayê xweşewitandinê bûye.

Herçiqas serjimêriyên fermî yên Komara Îslamî di çi warî de ji aliyê pispor û şarezayên serbixwe û zanistî nayên piştrastkirin, lê statîstîkên heyî derdixin holê ku di asta Îranê de salê 3 hezar kes xwe dikujin û ji sedî 37ê xweşewitandina jinan li Îlam û Kirmaşan çêdibe û Sine û Urmiye jî di nav wan parêzgehan de cîh digrin ku herî zêde jin xwe dişewitînin.

Lê xwekuştina jinan di 'rapora netewî ya tundûtûjî li dijî jinan' ku ji aliyê buroya Serokkomariyê hatiye weşandin, dide zanîn serjimêriya xwekuştina jinan li parêzgehên Kehkîloye û Buyer Ehmed, Îlam, Kirmaşan, Kurdistan (Sine) gellek ji rêjeya seranserî a Îranê zêdetir e. Rapora han destnîşan dike, li Kirmaşan û Îlamê jin rêya xweşewitandinê wek şêwazê xwekujiyê hildibijêrin ku herî metirsîdar û bixof e. Yek ji saziyên dewletê yên Parêzgeha Îlamê jî eşkere dike, di navbera salên 1382 (2003) heta sala 1386 (2007)an, herî kêm 2000 kesan xwe kuştine ku bi vî awayî ye: "Sala 1382an 485 kes, sala 1383an 337 kes, sala 1384 320 kes, sala 1385an 417 kes û sala 1386an 387 kes." Temenê kesên xwe dikujin di navbera 15 - 35 saliyê ye. Çavkaniyên ne fermî jî diyar dikin, di salê de nêzîk 400 kes tenê li Îlamê xwe dikujin ku herî kêm bûyer tên ragihandin, ji ber ku berpirsyar serjimêriyan diveşêrin.

Ew karnama lawaz ya Komara Îslamî bûye sedem ku li gor daxuyaniyên Saziya Tendurustiya Cîhanî, Îran sêyemîn welatê cîhanê ye ku serjimêriya xwekuştina jinan zêde tê kirin. Welatên yekem û duyem jî Çîn û Hindistan in ku rêjeya xwekuştina jinan di wan de herî zêde ye. Saziya Tendurustiya Cîhanî diyar dike di salê de yek milyon mirov xwe dikujin û aliyê kêm di her 40 çirkeyan de kesek li cîhanê xwe dikuje. Lê ligel wêya ku rêjeya xwekujî û bi taybet xweşewitandina jinan li Îranê ewqas zêde ye, lê rayedar ne amade ne pirsgirêkê bipejirînin û bi tu awayekê naxwazin agahiyên dursit û berfireh di vî warî de bên weşandin. Bo nimûne du bijîşkên Kirmaşanê bi navên Areş û Kamyar Elayî ku çend sal berî niha dixwastin derbarê nexweşiya AIDSê lêkolînan bikin, çend sal e ji aliyê Komara Îslamî hatine girtin û wek tawanbarên mezin bi wan re tevdigerin û niha jî di girtîgehê de ne. Bi baweriya pisporên civakî û civaknasan, xweşewitandin corek nerazîbûna nehênî ye beramberî pirsgirêk yan rewşa heyî û ji hemûya rêyên din yên xwekuştinê zêde bixeter û bixoftir e. Ligel vê çendê ku xweşewitandina jinan li her çar parêzgehên Rojhilatê Kurdistanê herdem mijara rojev a civak, medya û semînar û civînanên cur bi cur bûye, lê pêwîstiya herî giring bo jiholêrakirina vê diyardeyê ku çareserî ye, nehatiye praktîzekirin û bi kiryar tu gavek erênî nehatiye avêtin. Zêdebûna serjimêriya xwekuştin û bi taybet xweşewitandinê jî vê rastiyê diselimîne.

Berî her tiştî sîstemên hikûmetî berpirsyarê çareserkirina hemû pirsgirêkên hundirê civakê ne û divê bo çareseriya kûr û bingehîn, kirîz û pirsgirêk bi awayekî hûr û berfireh bên nirxandin û mekanîzmên pratîkî jî bên destnîşankirin. Herwiha gerek ji bo kontrlokirina pirsgirêkan jî bi cidî xebat bê kirin. Lê ji bo çareserkirina diyardeyek wek xweşewitandina jinan beriya hemû tiştekê naskirina sedem û sebebên van pirsgirêkan hewce ye, eger ev du fakter bi berfirehî neyên nirxandin, derbasbûn ji wan dibe encama piştguhavêtin û bê çareserî hêlana wê fenomena civakî. Loma di çendîn




salên borî de, ligel zêdebûna xweşewitandina jinan li parêzgehên Rojhilatê Kurdistanê, xuya dibe ku pirsgirêkek wiha metirsîdar ku jiyana civakî bi gefên micid re rûbirû kiriye, bê çareserî maye. Bandorên neyênî yên çaresernekirina xweşewitandina jinan gihaye astekê ku niha hêdî hêdî bûye mode û rêbazek bo gelek jinên xwedî pirsgirêk. Ji bo çareserkirina vê diyardeyê û yên din jî, divê destpêk lêkolîn û nirxandineke zanistî û berfireh û dûrî hemû awayên sansorê bê kirin û dûre sedem û sebebên wêya ku mirov rûbirûyê xemgînî, bêhêvîbûnê dibe û hest dike gihîştiye niqta dawî ya jiyana xwe, bê destpêkirin. Piştre divê li pey bersivên wan lêgerîn were kirin ku ji ber çi li Îlam û parêzgehên din ên Rojhilatê Kurdistanê xwekuştin û bi taybet xweşewitandin ewqas zêde ye. Çima herî zêde jin dibin armanca wê diyardeyê?

Herçiqas çalakvanên mafê jinan li Kurdistanê sedemên xwekuştin û xweşewitandina jinan 'pirsgirêkên malbatî, baweriyên olî û kevneşopan, civaka mêrserdest, zewaca zû û bi zorê, hejarî û pirsgirêkên aborî' wek sedemên sereke yên wê diyardeya mezin dihesibînin, lê pispor û karnas qanûnên ne wekhev wek çavkaniya tundûtûjî li dij jinan û binpêkirina mafê wan wek sedema sereke dizanin, lê rêya herî baş bo çareseriyê guherîna qanûnên Komara Îslamî ya Îranê û piştgirî ji mafê jinan, destnîşan dikin.

## Pêtir ji 25 ji sedî a bêkarên Îranê xwediyê xwandina di astek bilind in

Ligor ragihandina salnameya amara 1387'an Rojî ku ji aliyê nawenda serhejmêriya Îranê hatiye belavkirin, 96,8 ji sedî ji bêkarên Îranê xwandevanin. Herwiha 373 hezar û 513 kes ji bêkarên welat, xwediyê xwandina bilind in ku 45,2 ji sedî ji mêran û 54,8 ji sedî ji jinan pêkhatine. Amarên berdest xuya dikin bêkariya jinan zaf pêtir ji a mêran e, çunku amara xwandina jinan di zanîngehan de pêtir ji 60 ji sedî ye lê rewşa kar bi awayekê hatiye rêkxistin ku derfeta kar ji bo mêran pêtir e.

Bi avirdan ji wê yekê ku hatina zêde ya jinan bo bazara kar ya ku pêtir ji a mêran e, gerek bazara kar bi awayek bihê rêkxistin ku ji hewcehiyên kar ên jinan re bersivder be. Rayedarên bazara kar dibêjin nebûna rakêşana bala xwandevanên derçû



ên zanîngehan yek ji girîngtirîn pirsgirêkan e ku di dirêjiya wê rewşê de, pêlek mezin a bêkariya xwandevanên bilind dê welatê bigre.

## Serlêşêwana bi sedan hezar zarokên Efxanî li Îranê



400 hezar zarokên penaber ên Efxanî di Îranê de xwediyê kêmtirîn îmkanatan in. Seba zafbûna rêjeya zarok bûnê di nava penaberên Efxanî ên di Îranê de, niha 400 hezar zarok li wî welatî hene ku li Tehranê sergerdanin. Seba mifahsitandinên şaş, nebûna xwarinê, derzî û derman û îmkanatên destpêkî, piraniya wan tûşî nesaxî û mifahsitandinên xerab dibin ku ragihandin heya ji wê pirsê ninin û tucar eşkere nebûne û heta tu amarek dirost di warê xesarên ku ew zarok tûş dibin destneketiye.

www.arsivakurd.org

# Zimanê Me Nasnameya Me Ye

**Beşa 2**



**Mecîd Cinîkanlo**

**D**ema ku îslamîstan di Îranê de deshilat bi destve girt, rejîma wan bi hemû awayekê dest bi pirosesa asîmîlasîyonê li Rojhilatê Kurdistanê de kir, û bi hemû awayekê ev siyaseta qirêj dan meşandin. Her li destpêkê de neteweya Kurd, daxwazên xwe pêşkêşî desthilatdarên nû kirin, lê mixabin rejîma melayan bi hemû awayekê dest bi tepesrkirina xelkê Rojhilatê Kurdistanê kir û daxwazên wan bi gulleyan bersiv dan.

Yek ji xalên herî bi hêz ku Kurdan li Rojhilatê Kurdistanê dixwastin ku ji bo wan li desthilata nû de bihête berçavgirtin, xwandin û nivîsîn bi zimanê dayîkî bû. Lê rejima nû bi çi awayekê ev xwastekên Kurdan qebûl nekirin û vê carê li jêr perdeya dînê îslamê dest bi asîmîlasîyonê kirin.

Gerokekî Almanî ku li sala 1948'an serdana bajarê Kirmanşanê dike wiha dinivîse: Kirmaşan bajarekî her xweş û dewlemend e. Xelkê bajêr hemû bi zimanê Kurdî diaxivin û kincên Kurdî li xwe dikin! bê şik û guman eger îro rojê em serdana bajarê Kirmanşanê bikin, em ne cilê Kurdî û ne jî zimanê Kurdî bi vî awayî ku ev gerokê Alamanî nivîsandîye dibînin.

Di rastî de hemû rejîm û zordarên Kurdistanê li siyaseta xwe ye asîmîlasîyon û jinavbirina zimanê Kurdî wek hev kar kirine û ev siyaset meşandine.

Bê şik û guman dezgahên ragehandinê li vê siyaseta qirêj de bandorek herî bi hêz hebûne û li rastî de bi peydabûn û hatina wan dezgehan rejîmên dagîrker bi hemû awayî ev piroseye daye meşandin û karîn hêdî hêdî nasnameya parek zor ji Kurdan ji wan bistînin.

Yek ji mafên herî destpêkî yê mirovan axavtin bi zimanê xwe yê dayîkê ye û eger zarokek li xwandin û nivîsîna bi zimanê dayîkê bihê bê parkirin, derbeyekî herî xurt li jiyan û pêşeroja wî/wê dikeve û ev zarok ji aliyê hizrî û derûnî de dikve jêr bandora rewşeke pir zehmet de, ku pêwendiya hizirkirin û axavtinê li nav diçe. Çimku mirov bi zimanê xwe yê dayîkê qise dike û hizr û nêrînên mirovan bi awayê peyvan li zimanê mirovan tê û li rastî de ziman bingeha awabûna kesayetiya mirovan e.

Zimanê daykê ev zimane ye ku mirov li yekem rojên li dayîkbûna xwe de, dayîk û bav tevî mirov bi vî zimanî qise dikin. Ev mafê destpêkî ji aliyê NY ve ji bo hemû mirovan bi fermî hatiye naskirin û dibe her deshilatek derfeta xwendina bi zimanê dayîkê ji bo gişt neteweyên akincî li welatê xwe de desteber biket.

Li yasaya bingehîn ya Komara Îslamiya Îranê û li maddeya 15'ê de hatiye ku: mifahvergirtin li zimanê herêmî û qewmî li dezgehên ragehandinê û xwandin û nivîsîna wan zimanan li xwandingehan li tenişt zimanê Farsî azad e.!?

Pêka yasaya Komara Îslamiya Îranê xwandin bi zimanê dayîkê azad e! Lê çima ev mafê destpêkî ku rejîmekî dîktator wek Komara Îslamî vî mafî dibîne, nayê birêvebirin?

Li rastî de li jêr desthilatekî dîktator wek Komara Îslamî a Îranê de ku li navbera desthilat û civakê de pêwendiyek nine û desthilat xelkê tepeser dike, hemû ev mafane ku li yasaya wan da hatine, tên bê qîmetkirin û eger ji aliyê wan neteweyan ve gaziyek ji bo wan mafan bihê kirin, bi şêweyên herî tund tên cezakirin.

Li Îrana jêr desthilata Komara Îsalmî de neteweyên wek: Kurd, Azerî, Beluç, Ereb û Turkmen dijîn, ku hemû ev netewane piraniya nifusa Îranê pêk tînin, lê ji aliyê rejîma melayan ve tên tepeserkirin û li xwandin û nivîsîn bi zimanê dayîkê bê par in.

Rejîma Îranê wan neteweyan wek gef bo ser ewlehiya xwe mêze dike û bi hemû awayî li hewl û têkoşînê ye ji bo ku bikare wan zimanan li nav bibe.

Her mirovekî çend nasname hene, lê ya herî bi hêz, zimanê wî/wê ye. Çimku mirov berî vê yekê ku bizane peyrewê çi olekê ye, ya xelkê çi welatekê ye, bi zimanê xwe dijît û bi zimanê xwe jiyanê fêm dike û ev car pêka zanîna zimanê xwe welat, regez û hemû tiştên din fêm dike û ji bo wan xebatê dike.

Haydgir, Feylesofê Almanî li ser zimanê dayîkê dibêje: Hebûna mirovan li maln de bi zimanê wan e û zimanê dayîkê zimanê pêywendiyê nine! Em li zimanê wêjeya Kilasîk a Erfaniya xwe, bi zimanê dayîkê hest û dil dibêjin! Zimanê dayîkê soz, dil û hesta mirovan e, ku wisa be ev kesên ku dixwazin zimanê dayîkê yê mirovan ji wan bistînin li rastî de tevî hebûna wan mirovan şer dikin û nikarin serkevtinê bi dest bînin.

Zimanê Kurdî wek zimanekî herî kevnar li cîhana îroyîn de, û bi piştîvaniya çandî û dîroka xwe heta iro rojê hatiye pêş û di vê rêya bi asteng de, gellek ji rewşenbîrên Kurd cangorîtî kirin, heta ku ev zimane bi vî awayî paqij bimîne û bigihje destê me. Dayîk û bavên me bi gotina çîrok û serpêhatiyan, bi xwandina kilam û stranan, bi nivîsandina vî zimanî û hin caran bi şer û berxwedanê ev zimanê şîrîn li metirsiya jinavçunê rizgar kirine û wek emanet û nasnameya me gehandine destê me. Îro rojê bi derkevtina TV û ragehandinên pêşkevtî, erkê li ser milên rewşenbîrên kurd û her takekî civaka kurdî ye ku ji bo parastina vî zimanî xebat û têkoşînê bikin.

Rêxistina Neteweyên hevgirtî sala 2008'an wek sala zimanê dayîkê bi nav kir û Enîstîtuya Kurdî ya Parîsê Sala 2010'an wek sala zimanê Kurdî bi nav kiriye. Bila em hemû bi hevre ji bo ziman û çanda xwe xebatê bikin û bi vî awayî serbarê rêzgirtin li xebat û cangorîtiya rêber û pêşengên xwe, em nasname û kesayetiya xwe li xetera jinavçunê biparêzin û bi hevre ji bo zimanê xwe xebatê bikin.

*Kaniya Helbestan*

## Jina Jîndar




**Roza Kurd**

Delal, dilsoz,
Dilovan, bendewar
Û Fedakar im.
Ne dilsar im
Dilgerm,
Hest tenik û nazdar im.
Heval, hogir,
şervan û mizgîn
Pakrewanek şiyar im.
Xwînşêrîn,
Bedew û kevok
Ez Afrodite me.
Xweza, gul,
xecxecok û binefş
Buhar û avdar im.
Dayika kêmxew
Derya kul û derdan
Tekoşer, zîrek
Û stûna malê me
Ez jina jîndar im

www.arsivakurdi.org

agiri

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com



## Bext Ji Alîgirên Ehmedînijad Li Kûpa 2010'an De Zivirî!




Jiber ku hin taximên welatên dijberê Komara Îslamî li kûpaya 2010'an de biser neketin, ji karibidestên Komara Îslamî re bû mijarek balkêş û bi gotinên xorafatî û ecêb dîsan xwe kirin pêkenokê alemê.

Wezîrê Derve Yê rejîmê ragihand: Jiber ku ew piştevanê tehrîmên li dijî Îranê bûn, biserneketin. Lê gellek nekişand ku bext û felek ji taximên alîgirên wan jî vegeriya û yek li pey yê din li hember taximên welatên razî û alîgirê dorpêçan, tûşî şikest û dorandinên bişerm hatin û ji kûpa cîhanî destvala vegeriyan. Bi taybet tîma Birazîl û Arjantînê, ku stêrkên kûpayên berê bûn. Ji hêla din ve jî rahênerê taxima Arjantînê Maradona, ku berê kirasê xwe jî ji Ehmedînijad re kiribû diyarî û ji kesatiya wî pir hez dike, serbarê dorandinê, bi hin riftarên nebaş bi temaşevanên Alman re dîsan bûye rojeva medyayan û nîşan da ku her jêhat û hêjayî hevaletî û alîgiriya Ehmedînijad e.

## Mihemed Moitadê Binzînê Ye



Ligor malpera Mêhr, li gondekê ser bi bajarokê Eşrefiye a bajarê Gîlana Îranê, zarokek bi navê Mihemed, motadê binzînê bûye û bi bê binzîn najî. Bavê wî dibêje ku Mihemed di temenekî biçûk de fêrî binzînxwarinê bûye û niha jî bi tu awayekê nikare terk bike. Ger binzîn jê xelas bibe pêşî ji matorsîklêtan digre yan jî dest bi dizîna binzînê dike. Herwiha dayîka wî dibêje, dema ku ji Mihemed ducan bûye, keyfa wê bi bêhna binzînê dihat û gelek binzîn bêhn dikir. Hêjayî gotinê ye ku pizîşkê wî gotiye ku Mihemed berdewam binzînê dixwe, lê çi nîşanek nesaxî û metirsiyek ji Mihemedê binzînxwar re nine.

## Stranek Farsî Ji Bo Ferzad Kemanger



Di karê xwe yê herî nû de, Hunermendê Stranbêj ê Fars Şahîn Necefî, stranek bi navê "Berader" (Bira) ji bo şehîd Ferzad Kemanger amade kiriye û pêşkêşî dayîka wî "Daye Seltene" kiriye.

Helbesta vê strana ya Şahîn Necefî bi xwe ye. Aheng û parvekirina wê ji hêla Babek Xezayî ve ye. Di vê stranê de mifah ji muzîka kurdî jî hatiye wergirtin ku xweşiyek taybetî daye stranê.

Hêjayî gotinê ye ku Ferzad Kemanger, mamosta di xwendingehên bajarê Sine de, 9'ê Gunala îsla di girtîgeha Êvîn a Tehranê ji hêla hêzên ewlehî yên Komara Îslamî ya Îranê ve di gel 4 kesên din hate darvekirin, ku bû sedema narezayetiya cîhanî gireva gireva giştî li Kurdistanê de. Aknews/ Ş-M

## Kurdê Ku Pêlava Xwe Girte Erdoxan, 3 Sal Ceza Xwar



Xortê Kurd Hukman Cuma yê 27 salî, di 22 ê Reşemeya îsal, li Sevilla bajarê Spanyayê de pêlava xwe havîtibû Serokwezîrê Tirkiyê Teyip Erdoxan û gotibû "Viva Kurdistan" (Bijî Kurdistan).

Wî ragihandibû ku armanc ji wî karî bal kişandina ser pirsa kurd li Tirkiyê de bûye.

Cuma li Spanyayê hate darizandin, û 3 sal cezayê girtîgehê û cezayê pereyê nextî jî li wî birîne.

## Li Somalê Cezayê Temaşekirina Mondiyalê, 39 Qamçî Ne





Grûpeke ciwanan ku navê Cemaeta Ciwanên Somalî li xwe kirine, dest bi operasyona şopandina wan kesan kirine ku li Mondiyalê temaşe dikin. Cemaet bi şev û roj dawêjin ser malan û kesên ku li gokapê temaşe dikin, digirin û wan didin bin lêdaneke giran.

Ciwanekî ku di dema temaşekirinê de hatiye girtin, dibêje: li dema temaşekirina leyîza Alman û Australya de, grûpeke Cemaetê avêtin ser mala min û ez girtim, bi tundî li min xistin, porê min tiraşîn û piştre 39 qamçî jî li min dan û ez berdam. Herweha hin caran jî cezayê bi qasî 50 Dolarî jî dide wan kesan.

Êdî li Somalê kesek nikare bi dizî li Maçên cîhanê temaşe bike û yek ji sûçên herî giran tê hesibandin, ji ber vê yekê kesên ku temaşe dikin, pir bi nehênî û bêyî ku kesek bi wan bihese, derî li ser xwe kilît dikin û fersenda temaşekirinê bi dest xwe tînin.
**Avesta**

## Seyîd Sadiq Şîrazî: Mozîk Dibe Hegera Rizîna Didanan



Mela Seyîd Sadiq Şîrazî di malpera Şîe News de li ser mozîk û şetrencê gotiye: xêncî wan zirarên ku zanista roj li ser mozîk û şetrencê îspat kirine, der ketiye ku mozîk di derûna mirov de îhsas û heyecanê pêktîne. Heyecan jî sedemê piraniya nesaxiyan e û heta dibe sedema rizandina didanan, cuda ji cezayê giran ku Xwedayê zana di qiyametê de bo guhdarên mozîkê şibî agirê cehnemê amade kiriye.